



K.T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

EFSANEYÊN LI HERÊMA HEKARÎYÊ

Xwendekar

Suna GÖKALP

22721024

Şêwirmend

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Mardin 2024

K.T.

**ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

EFSANEYÊN LI HERÊMA HEKARÎYÊ

Xwendekar

Suna GÖKALP

22721024

Şêwirmend

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Mardin 2024

T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

PROJE ONAYI

Enstitümüzün Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı 22721024 numaralı öğrencisi Suna GÖKALP'in hazırladığı “Efsaneyên li Herêma Hekarîyê” başlıklı BİTİRME PROJESİ ile ilgili SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 30.01.2024 tarihinde saat 13:00'da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Danışman..... (İmza)

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Üye (İmza)

Dr. Öğr. Üyesi İbrahim TARDUŞ

Üye (İmza)

Dr. Öğr. Üyesi M. Şirin FİLİZ

...../...../2024

.....

Enstitü Müdürü

(Doç. Dr. Ahmet KIRKAN)

DAXUYANÎYA ETÎKÊ

Di vê xebata ku min li gorî rêbazên nivîsandina tezê ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê amade kiriye;

- Min hemû agahîyên di projeyê da, di çarçoveya reftarên etîk û rêbazên akademîk da bi dest xistine.
- Di qonaxên xebata projeyê da; di amadekarîyê, agahdarîyê, belgeyan, daneyan, berhevkirin û analîzkirina wan û pêşkeşkirina wan de bi etîka zanistî û rêbazên exlaqî tevgerîyam.
- Berhemên ku di xebata projeyê da hatine bikaranîn, min di çavkanîyê/bîbliyografîyayê de cih danê.
- Xebata projeyê orijînal e.
- Ez eşkere dikim ku, proje ji aliyê Zanîngeha Mardîn Artukluyê "bernameya testpîtkirina întihala zanistî" ve tê sehkirin. Bi tu awayî întihal nehatîye kirin. Di rewşeke beravajî gotinên min de ez hemû encamên qanûnî qebûl dikim.

Îmze

Suna GÖKALP

31.01.2024

KURTE

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

Efsaneyên li Herêma Hekarîyê

Suna GÖKALP

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Hejmara Rûpelan: 24

Efsane, ew hîkaye ne ku di derbarê; mirov ajel, riwek, heyînên derasayî, şaristan, rûdanên dîrokî, heyberên bêrih û hwd. de tînin gotin. Me jî di vê xebata xwe de behsa hin efsaneyên herêma Hekarîyê ku mijarên wan curbicur in kiriye. Jimara efsaneyan bi giştî bîst û yek in. Ji van efsaneyan gelek bi rêya hevpeyvînê hatin berhevkirin. Berhevkirina efsaneyan jî bi rêya qeydkirina dengên vegêran çêbû. Amanca vê xebatê berhevkirina efsaneyên li herêma Hekarîyê û polînkirina wan e. Ev xebat ji destpêk, encam û ji sê beşan pêk hatiye. Di destpêkê de em li ser amanc, çarçove, sînorên xebatê, rê û rêbazên xebatê sekinîne. Di beşa yekem da em li ser pênase û hin xususîyetên efsaneyê, xebatên li ser efsaneyê û tînkiliya efsaneyê bi vegêranên din re sekinîne. Di beşa duyem de jî em li ser hin taybetîyên herêma Hekarîyê û kurteya dîroka Hekarîyê sekinîne. Di beşa sêyem de ew dengên qeydkirî hatin deşîfrekirin û di gel agahîyên derbarê vegêran li xebatê hatin zêdekirin. Di encamê de polînkirina wan efsaneyên berhevkirî hat kirin.

Peyvên Sereke: Efsane, Hekarî, Berhevkirin, Polînkirin.

ÖZET

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

Hakkari Yöresine Ait Efsaneler

Suna GÖKALP

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Sayfa Sayısı: 24

Efsane; insan, hayvan, bitki, medeniyetler, olağanüstü varlıklar, tarihi olaylar, cansız varlıklar vb hakkında söylenen hikayelerdir. Biz bu çalışmamızda Hakkâri yöresine ait farklı türden efsanelere değindik. Toplam yirmi bir efsane derledik. Bu efsanelerin birçoğu yüzyüze görüşme şeklinde anlatıcının sesi kaydedilerek derlendi. Bu çalışmanın amacı Hakkâri yöresine ait efsanelerin derlenip sınıflandırılmasıdır. Bu çalışma: Giriş, üç bölüm ve sonuç şeklindedir. Giriş bölümünde çalışmamızın amacı, çerçevesi, sınırı ve yöntemlerine değindik. Birinci bölümde efsanenin tanımı ve özellikleri, efsane üzerine yapılan çalışmalar ve efsanenin diğer halk anlatı türleri ile olan ilişkisine kısaca değindik. İkinci bölümde Hakkâri yöresinin özellikleri ve kısa tarihine değindik. Üçüncü bölümde kaydedilen sesler deşifre edildikten sonra anlatıcının bilgileriyle birlikte çalışmaya eklendi. Sonuç bölümünde ise derlenen efsanelerin sınıflandırılması yapıldı.

Anahtar Kelimeler: Derleme, Hakkâri, Efsane, Sınıflandırma.

ABSTRACT

Without Thesis High Licence Finish Project

Legends of Hekarî Region

Suna GÖKALP

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Türkîye

Kurdish Language and Culture Department

Number of Pages: 24

Legends are stories that are told about people, animals, plants, civilizations, extraordinary beings, historical events, inanimate objects so on and so forth. In this study, we have touched upon different types of legends belonging to the Hekkari region. We have compiled a total of twenty one legends. A number of legends were compiled by recording the voice of the narrator in a face-to-face interview. The purpose of this study is to compile and classify the myths of the Hekari region. This study consists of the introduction, three parts, and conclusion segments. The purpose of our study in the introduction segment, we have mentioned its framework, limitations, and methods. In the first part, we have briefly mentioned the definition of the legend and its features, the studies that are carried out on the legend and the relationship of the legend with other types of folk narratives. In the second part, we have mentioned about the brief history and characteristics of the Hekari region. After the recorded sounds in the third section were deciphered, they were added to the study along with the narrator's information. When it comes to the conclusion part, the compiled legends were made to be classified.

Keywords: Legend, Hekarî, Compilation, Classification.

PÊŞGOTIN

Ji vegêranên geleri efsane, ji wextên berê heta îro di civakê da cihekî giring girtiye. Efsane ew hîkaye ne ku di derbarê mirov, ajal, riwek, heyînên derasayî, şaristan, rûdanên dîrokî, heyberên bêrih û hwd tên gotin. Bi xêra efsaneyan em hay jî rabûn û rûniştin û bîr û bawerîyên civakekê dibin

Ji ber parastina çand û edebîyata devkî tomarkirina efsaneyan muhîm e. Di vê çarçoveyê da mebesta vê xebatê berhevkirina efsaneyan e. Me jî bi vê mebestê, hindik be jî ev kar hilgirte ser milê xwe û di erdnîgarîyeke teng de hindî ji me hat me karê berhevkarîyê kir. Di vê xebata li ber destê we de 21 efsaneyên herêma Hekarîyê hene. Lê mixabin her çiqasî xebata me bi navê Efsaneyên Herêma Hekarîyê be jî, me ev kar di sînorekî tengtir de (Gundên bi navên: Aşûtê, Minyanîşî, Derava Seyîdan, Aroş, Elemûn) kir. Di vî sînore teng de jî ez bawerim bi sedan efsane dikare bîn berhevkin lê mixabin ji ber dûrbûna min ya ji herêmê û ji wextê teng ev ji destê min hat.

Her çiqas mebesta me karê berhevkarîyê be jî me di xebata xwe da cih daye pênase û xisûsiyetên efsaneyê, xebatên li ser efsaneyê û têkîlîya efsane û cureyên din yên vegêranên gelêrî. Her wiha me di beşeke xebata xwe de cih daye herêma Hekkarîyê ku di vê beşê da behsa hin taybetîyên Hekarî û dîroka Hekarîyê hatiye kirinê. Beşa dawî ya xebatê deşifreyê efsaneyên hatine qeydkirinê ye. Agahîyên vegêrên efsaneyan piştî efsaneyan hatine danîn. Di encamê de jî nirxandinek giştî li ser ew efsaneyên berhevkirî hatiye kirin.

Piştî ez ketim vî karî ez têgihîştim ku di nav kurdan de çî gecîneyeke mezin ya efsaneyan heye. Ev hişmendîye bi saya mamosteyê min û şêwirmendê min yê hêja Kenan SUBAŞI çêbû. Ji bo vê û ji ber alîkarî û keda wî ya di vê pêvajoyê de ez spasdarê wî me.

Helbet di vê xebatê da keda gelek kesên din jî heye. Ji wan yek dayîka min Qudret EDÎŞ û yê din jî bavê min H. Selman EDÎŞ e ku ez bi çîrok, metelok, efsane û pêkenokên wan mezin bûme. Her wiha gelek keda endamên din yên malbata min

û hevalên min hene. Ez spasîya wan û ya vegêran dikim ku ji min re bi dilxwazî
efsane vegotine.

NAVEROK

NAVEROK	VI
KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
PÊŞGOTIN	IV
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK	1
Rê û Rêbazên Xebatê	1
Sînorên Xebatê.....	1
Amanca û Çarçoveya Xebatê.....	1

BEŞA YEKEM

EFSANE

1.1. Efsane û Taybetîyên Efsaneyê	2
1.2. Xebatên li ser Efsaneyan.....	3
1.3. Têkilîya Efsaneyê bi Cureyên din re.....	4

BEŞA DUYEM

HEKARÎ/COLEMÊRG

2.1 Taybetîyên Bajarê Hekarîyê/Colemêrgê	6
2.2 Dîroka Hekarî/Colemêrgê	7

BEŞA SÊYEM

EFSENEYÊN HERÊMA HEKARÎYÊ

3.1. Efsaneya Siyabend û Xeco.....	9
3.2. Efsaneya Gira Marî	10
3.3. Efsaneya Şêx Smayîl.....	10
3.4. Efsaneya Şêx Hecî Elî.....	11
3.5. Efsaneya Şêx Behedîn.....	11
3.6. Efsaneya Bizina Berze/Wenda.....	12

3.7. Efsaneyaya Xeyirbûna Heyvê.....	12
3.8. Efsaneyaya Pîra Mirovxwer.....	13
3.9. Efsaneyaya Tokê.....	14
3.10. Efsaneyaya Kûseleyê	15
3.11. Efsaneyaya Werîs û Dastê	15
3.12. Efsaneyaya Ecîna.....	15
3.13. Efsaneyên li ser Zarokên Biçûk	16
3.14. Efsaneyaya Mohrka Şîrî	16
3.15. Efsaneyaya Dara Şehîd di bin de	17
3.16. Efsaneyaya Berê Sûmtî.....	18
3.17. Efsaneyaya Karvanan	19
3.18. Efsaneyaya li ser Çavên Diêşin	19
3.19. Efsaneyaya li ser Bîtîka Çavan	19
3.20. Efsaneyaya Tanyê.....	19
3.21. Efsaneyaya Jina Ducan û Marê Kûştî.....	19
ENCAM.....	21
ÇAVKANÎ.....	22

KURTEBÊJE

Hwd.	Her wekî din
Bnr.	Binêre
C.	Cild
B.Z	Berî zayînê
P.Z	Piştî zayînê
R.	Rûpel
Ç.	Çap
M.	Metre
Km.	Kîlometre

DESTPÊK

Rê û Rêbazên Xebatê

Ev xebata me ya bi navê “Efsaneyên li Herêma Hekarî/Colemêrgê” xebateke berhevkarîyê ye. Me bi rêya berhevkarîyê efsaneyên li herêma Hekarîyê kom kirin. Me di vê xebatê de çavkanîyen nivîskî, dîtbarî û zarekî bir kar anîn. Herwiha me agahî ji pirtûk, gotar, kovar ferheng û malperên curbicur yê internetê wergirtin. Efsane bi rêbaza guhdarkirin û qeydkirinê hatin berhevkin. Me hin hevpeyvînên xwe rû bi rû kirin lê yê ku derfet nebû em rû bi rû bikin jî bi rêya telefonê hatin kirin û dîsa bi rêbaza qeydkirinê hatin komkirin. Piştî xelasbûna karê komkirinê me ew efsaneyên ku ji aliyê vegêrî ve hatine gotin deşîfre kirin û li xebata xwe zêde kirin.

Sînorên Xebatê

Di vê xebatê de berhevkirina efsaneyan li herêma Hekarîyê hat kirin. Li vê herêmê jî ji çend gund û navçeyan efsane hatin komkirin. Ev gund û navçe jî ev in: gundên Aşûtê, Minyanîşî, Dêrê, Derava Seyîdan ku giredayî navçeya Çelê ne, gundên Aroşê, Elemûnê Geremûsê (berê ev der jî girêdayî Hekarîyê bûn) ku girêdayî navçeya Qilêbana Şirnexê ne û navçeya Bêşebaba Şirnexê.

Amanca û Çarçoveya Xebatê

Di vê xebatê de amanca me berhevkirina efsaneyên li herêma Hekarîyê ye. Herwiha piştî karê berhevkarîyê polînkirina wan û testbîtîkirina wan e ku bi gelemperî li ser çî hatine gotin. Ji ber ku berhevkarîya me bi hin devêrên Hekarîyê ve sînorkirî ma em nikarin bêjin ku tesbîteke giştî ye. Di gel berhevkirina efsaneyan me di beşeke xebata xwe de cih daye pênaseya efsaneyê, xebatên ku li ser efsaneyê hatine kirin û têkiliya efsaneyê bi cureyên din re. Herwiha di beşeke din ya xebata xwe de me herêma Hekarîyê (dîrok, çand erdnîgarî hwd.) daye nasandin.

BEŞA YEKEM

EFSANE

1.1. Efsane û Taybetîyên Efsaneyê

Xebatên li ser efsaneyan di dawîya sedsala 18. û di destpêka sedsala 19. de dest pê kirin. Lê giraniya xebatên li ser efsaneyan di sedsala 20. de dest pê kirin. Ji xebatên salên ewil heta îro gelek lêkolîner û folklorzanan pênaseya efsaneyê kiriye û li ser hin xalên hevpar hemfikir bûne. Efsane ji peyva “afsane”ya zimanê farisî tê ku vê peyvê jî bingeha xwe ji peyva “apasanha”ya zimanê awestayî girtiye ku tê maneya tişteki kirin, behskirinê. Ji bilî wê, ev peyv maneya efsun û sihrê jî dide (Nişaniyan Sözlük, 2021). Peyva efsaneyê çî ji bo vegêranên gelêrî çî jî ji bo têgeheke edebîyatê di gelek qadan de hatiye bikaranîn. Îro jî di bin navê efsaneyê de gelek çîrok û pêkenok û hwd berhev bûne. Ji bo ku mirov bizane ka efsane çî ye gerek mirov baş pênaseya wê bike û cudahiya wê û vegêranên din bizane.

Ji bo pênaseya vê peyvê wekî me li jor jî dîyar kiriye gelek lêkolîneran li ser hin xalên hevpar hemfikir bûne. Ev xal jî bingeha xwe ji pênaseya Birayên Grimm ya ji bo efsaneyê kiriye digire. Li gorî Birayên Grimm efsane, hikayeyeke ku derbarê cih, rûdan, şexsekî rastî an xeyalî tê gotin. Ev pênase jî sê xalên giring di xwe de dihevine.

1. Efsane li gorî vebêjer di wextekî dîrokî ve hatiye girêdan.

a) Efsane bi rûdaneke dîrokî ve (rast an xeyalî) hatiye girêdan.

b) Efsane, bi şexsekî (rast an xeyalî) hatiye girêdam

2. Efsane li gor vebêjer li cihekî rast derketiye.

3. Efsane li gor ew kesê vedibêje hikayeyek rast e (Sakaoğlu, 1980: 4).

Gelek lêkolînerên din bal kişandiye ser hin xususîyetên efsaneyan ku Max Luthî dibêje: efsane ew hikaye ne ku ji rastîyê çêbûne (Luthi, 2003: 314). Dîsa J. Petikainen (2003: 223) dibêje: “Efsane parçeyekî jîyanê ye.” Herwiha Wilfried

Buch (2003: 309) dibêje: “Efsane raporkirina wan rûdanên e ku berî her tiştî bala mirovî dikişîne û mirovî aciz dike.”

Ji van lêkolîneran Kenneth W. Mary û W. Clorke dibêjin ku efsane hîkayeyên di derbarê hadîse û şexsan in ku derdora wan bi bawerîyên rast an jî muhtemelen rast hatine dorpeçkirin. Li gor A. Georges Efsane, hîkaye an jî vegotinek e ku bi paşeroja nêzîk an jî dîrokî ve girêdayîye û vebêjer û guhdarvanan ve têkildar e û ji hêla wan ve tê bawerkirin. Herî dawî eger em qala folklorzanê tirk yê herî navdar P. N. Boratov bikin ew jî balê dikşîne ser alîyê wê yê bawerîyê ku li gorî wî xisûsiyeta herî giring ya efsaneyê ew e wexta ku vebêjer mijarê vedibêje rast an jî wek ku di rastîyê de qewîmîye tê qebulkirin. Herwiha ji bo şewaza wan jî gotiye ku bi gelemperî kurt in lê yên dirêj jî hene (vgz. Sakaoğlu, 1980: 5).

Piştî van agahîyan em dikarin bibêjin ku efsane:

- Ew vegêran in ku behsa kesekî, cihekî an rûdanekê dikin.
- Şiklekî wan yên xisûsî nîne, bi gelemperî kurt û bi zimanê rojane ne.
- Hin efsane dikare deresayî bibin.
- Vegêrekî wan yê taybet nîne, herkes dikare bibe vegêr.
- Di hin mijaran de pîroz in.
- Vegêr û gelek caran kesê guhdar dike jê bawer dike.
- Cih û mekanên efsaneyê tên zanîn.

1.2. Xebatên li ser Efsaneyan

Prototîpên efsaneyan (tezkîreya ewlîyayan ya navdar Golden Legend, Seyahatnameya Ewlîya Çelebî) di sedsala 14. û 15. de jî tên dîtîn lê ji ber ku ev berhevkarîye ji bo amanca xwe ya xisûsî derketine em nikarin wan li nav xebatên efsaneyê de bigirin. wekî me li jor jî behsa derketina xebatên li ser efsaneyan kiribû ku di dawîya sedsala 18. û di destpêka sedsala 19. dest pê kiribûn. Lê em dikarin bibêjin ku xebatên esil yên berê wan li efsaneyan ji alîyê Birayên Grîmm ve hatine destpêkirin. Xebatên wan û pênaseya wan ya ji bo efsaneyê kirî hîn jî ji alîyê gelek

folklorîstan ve tê qebûlîkirin. Xebata wan ya 2 cildî “Deutsche Sagen” ji bo gelek xebatên wan yên pêşerojê bibû bingeh.

Di heman salan de koleksiyonek din ya efsaneyan “Danmarks Folkesagn” ji aliyê J. M. Thiele ve di sala 1818-1823an ku ew jî hêjayî nirxandinê ye.

Heta sedsala 20. em dikarin bibêjin ku xebatên li ser efsaneyan ne zêde bûn lê belê di sedsala 20. de zêdehiyek mezin ket nav xebatên efsaneyan ku ev xebat lêkolînên hêja bûn. Di vê sedsalê de em dikarin navên wek; Karl Wehrban, Otto Böckel, Friedrich Ranke û Arnold van Gennep bijmêrin ku xebat û lêkolînên serketî derxistîne.

Heta sala 1959an xebatên li ser efsaneyan li ser şexsan dewam dikir. Lê belê di navbera salên 1959 û 1969an 6 kongreyên navneteweyî pêk hatin. Di van 10 salan de tekane mijara kongreyê efsane bûn. Amanca vê kongreyê efsane û xebatên li ser efsaneyan ji şexsîbûnê û gelbûnê derbixe û bike xebatên navneteweyî da ku pênasê û tesnîfa efsaneyan hêsantir bibe. Her wiha van folklorzanan komeleyek bi navê ‘*Internatiol Society for Folk-Narrative Reserch*’ ava kir. Vê komeleyê di her şeş kongreyên xwe de gelek biryarên giring stendin ku nemazê ji bo polînkirina efsaneyan katalogeke navneteweyî amade kirin û ev katalog hîn jî tê qebûlîkirin. Kongreya herî dawî di sala 1969an li Amerîkayê pêk hat û piştî vê kongreyê tu kongreyên navneteweyî pêk nehatin.

1.3. Têkilîya Efsaneyê bi Cureyên din re

Efsane cureyekî vegêrana gelêrî ye. Gelek caran bi cureyên din re(mît, çîrok û destan) tevlihev dibe em ê jî li jêr behsa cudahî û hevparîya van cureyêan bikin.

a) Têkilîya Efsane bi Mîtê re

Di van vegêranan de hevparîya herî mezin aliyê wan yê bawerîyê ye. Ji ber ku her du vegêran ji aliyê vegêrê/î ve rast tîne qebulkirin.

Di mîtan de dem demeke dûr e, lê di efsaneyan de ew dem demeke nêzikî roja me ye, an jî roja me bi xwe ye. Di mîtan de rûdan di cîhaneke berî ya me an jî cîhaneke din de diqewime, lê di efsaneyan de cîhan cîhana me ya. Di mîtan de

pîrozîyek heye û şexs û lehengên mîtan ji xweda an jî ji nîvxweda ne. Lê belê di efsaneyan de ev pîrozî ne teqez e, di hin cureyên efsaneyan de em vê pîrozîyê nabînin. Her wiha lehengên efsaneyan kes û tiştên di cîhane me de ne ku ev yek cudahîya her du vegêranan berbiçav dike.

b) Têkilîya Efsaneyê bi Çîrokê re

Efsane wek hikayeyeke rast lê çîrok jî xeyalî angû ne rast tî qebulkirin. Ji aliyê wext jî ve em dikarin cudahîyê wan bibêjin ku efsane di demeke nêzîk de qewimîye lê belê dema çîrokê nedîyar e. Me li jor jî dîyar kiribû ku beşeke efsaneyan pîroz nayên qebulkirin lê qismê wan yê ku behsa dîni dikin pîroz in. Di çî cureyên çîrokan de ev pîrozî nayê dîtin. Ji bilî van agahîyan em dikarin bibêjin ku mijarên gelek çîrok û efsaneyan hevpar in ku tenê ew xisûsiyetên me li jor dîyar kiribûn ferqa wan nîşan didin.

c) Têkilîya Efsaneyê bi Destanê re

Eger em behsa têkilîya van her du vegêranan bikin em dikarin bibêjin ku her du vegêran rast tî qebulkirin. Em dikarin destanan di nav rûpelên dîrokê de bibînin lê ji bo efsaneyan em nikarin vê yekê bibêjin. Cudahîyek din ya di navbera wan de ev e ku dema çêbûna wan e. Ji bo ku destanek çêbibe gerek wextekî dirêj di ser rûdana destanê re derbas bibe ku bibe destan. Cîhana her du cureyan cîhana me ye ev yek jî hevparîya wan e. Ji hêla pîrozîyê ve jî em dikarin bibêjin ku destan bêtir netewî ne lê ne pîroz in, lê beşeke efsaneyan jî dikare pîroz bibe. Her wiha em dikarin gelek motîfên efsaneyên neteweyekî di nav efsaneyên neteweyek din de bibînin. Lê destan tenê aîdî wî neteweyî ne ku rûdan lê qewimîye.

BEŞA DUYEM

HEKARÎ/COLEMÊRG

2.1 Taybetîyên Bajarê Hekarîyê/Colemêrgê

Hekarî berê navê herêmeke berfireh bû ku navênda wê Amêdî(navçeya Dihokê) bû. Lê aniha ji bo navenda Colemêrgê tê bikaranîn. Peyva Hekarîyê ji du bêjeyan pêk hatiye: “Her” û “Karî”ango yê her tiştî karin bikin an jî yê her wext bihêz. Her wiha li gor hin agahîyan navê Hekarîyê ji navê eşîreke bi navê “Hekkar” tê ku di sedsala dehan de li herêmê dijîyan. Navê Colemêrgê jî ji du bêje û ji daçekê pêk hatiye: “Co”, “le” û “Mêrg” ev jî tê maneya mêrga ku cokên avê lê ne an jî mêrga biav. Ev nav ji dema Memlûkîyan tê. Navê Hekarîyê bi zimanê ermenîyan “İlmar” bi zimanê suryanîyan jî “Gularmak” e.

Sînorên bajarê yê niha li bakûr bi Wanê, li rojava bi Şernex û Sêrtê ve, li başûr bi Dihokê ve û li rojhilat jî bi Wirmê ve tê girêdan. Pîvana erda herêmê 9.521 km² ye. Piraniya erda herêmê ji çiyayan pêk tê. (87,6%), deşt (2,1%), plato jî (10,3%) ne. Ji ber çiyabûna herêmê çandinî kêmtê çandin. Tenê û gûz ên herî pir in ku li herêmê tên çandin. Li geliyên herêmê, birinc, kuncî û fêkî jî tên çandin. Li herêmê du cureyên avhewayê hene. Ber bi aliyê çiya ve avhewayê sar, reşahî û li deverên geliyan jî avhewayê Behra Spî serdest e. Herêm zivistanan pir sar û dirêj, havînan jî hênik derbas dibe. Li herêmê çiyayên bilind hene ku hinek ji wan ev in: Reşko(Gelîyê Şîn, 4.135 m.), Munsel(3.850 m.), Gelyano(3.650 m.), Garê(3.460 m.), Geverokê(3.356 m.), Termo(3.356 m.), Barêdalo(3.250 m.) û Çiyayê Reş(3.630 m.) Her wiha bi deşt û zozanên xwe jî bi navûdeng e: Deştê Geverê.(175 km² ye deşt li dora Çemê Nihêlê ye, ji behrê 1.900 m bilind e). Gelîyê Xabûr(di navbera çiyayê Termo û Tanîn de ye). Geliyê Avarobaşîn (di navbera çiyayê Cîlo û Sat de ye). Geliyê Zabê li dora çemê Zabê ye. Geliya Şemzînan jî li rojhilata bajarê Hekarîyê ye. Zozana Kanimahanê ku li dora gunde Çarqelayê ye.

Ji bilî agahîyên jor em dikarin bibêjin ku Colemêrgê ji aliyê ziman, çand û edetên xwe ve li gor gelek bajarên Kurdistanê xwe parastîye. Ev yek hem ji ber

serjimara kurdan(%98) ya ku li bajarî serdest e hem jî ji ber erdnîgarîya wê ya ku her çend alîyan ve bi çiyayên asê dorpeçkirîye.

2.2 Dîroka Hekarî/Colemêrgê

Hekarî bajarekî xwedî dîrokeke gelek kevnare ye. Ev bajar ji destpêka dîrokê heya niha ji bo gelek qewm û neteweyan bûye jiyangêh. Ev ji wêneyên li ser kevîran tê famkirin. Hin wêne di B.Z 7000ê de hatine xêzkirin. Zêdehiya van wêneyan li Geliyê Geverokê ne ku xwedî dirêjîyeke 2600 mîtroyan e. Piraniya wan wêneyan de pezkovî hene. Her wiha di wêneyan de kemînên ji bo nêçîra pezkoviyan, yên mirovan û amûrên nêçîrê yên wek çûv di destê wan mirovan de hene. Komêk wêneyên kevîran jî li Girê Hendevedayê hatine dîtin. Di van wêneyan de tiştê ku diyar dike jî mirovên wê demê hem nêçîratî kirine hem jî derbasî çandiniyê û jiyana dimatiyê bûne.

Agahiyên ewilîn yên di derheqê Hekarîyê de di sedsala 10. de ji çavkaniyên erdnîgarî û dîrokê yên Ereban de tên dîtin. Agahiyên nivîskî yên Kurdistana Bakur ku Hekarî jî di nav de di B.Z(Beriya Zayînê) ji sedsala 13. destpê dike û ji nivîskên Asûriyan hatine destxistin. Di van nivîskan de tê diyarkirin ku komên li vê devera çiyayî ji B.Z 2000ê heya B.Z 900ê wek Begên serbixwe hebûna xwe domandine. Li Hekarîyê gelek qewman deshilatdariya xwe pêkanîne ku ji wan qewman Êrtartûyan, Medan, Aqadan, Asûriyan, Persan, Makedoniyên, Selokiyan, Sasaniyan, Romiyan, Selçûkiyan, Osmaniyan û Safeviyan deshilatdarî kirine. Hem di dema Osmaniyan de hem jî dema Safeviyan de ji ber ew talanên ku dawîya wan nebûn herêma Hekarîyê hemû deman hatiye dagirkirin. Ji ber şerên berjewendiya împeratorên du alîyan hemû eş gelê kurd kişandiye. Hekarî/Colemêrg ku bi Osmaniyan ve hatiye girêdan piştî damezirandina Komara Tirkiyê di sala 1924an de digihije statûya bajariyê lê belê piştê bi Wanê ve hatiye girêdan. Piştî sala 1936an dîsa wekî bajar hatiye hesabandin. Hekarî/Colemêrg anîha bi navçeyên xwe Gever, Şemzînan, Çelê ve hatiye sînorkirin.

Kronolojiya bajêr

BZ (Berî zayînê)

- 1000 - 585 Dema Ûrartûyan
 - 585 - 550 Dema Medan
 - 550 - 331 Dema Persan
 - 331 - 323 Dema Makedoniyan
 - 88 - 66 Hukumdariya Tîgran
 - 66 Dema Romiyan
- PZ (Piştî zayînê)
- 297 - 638 Dema Sasaniyan
 - 978 Dema Ereban
 - 1054 Dema Selçûqiyan
 - 1142 Hukumdariya Îmaddîn Zengî
 - 1343 Dema Karakoyuniyan
 - 1360 Dema Mîrîtiya Hekkariyan
 - 1386 Dema Moxolan
 - 1405 Dema Mîrîtiya Hekariyan(Duyemîn)
 - 1534 Dema Osmaniyan
 - 1855 Serhildana Îzzedîn Şêr
 - 1914 Dema Rûsan
 - 1918 Dema Tirkan
 - 1924 Serhildana Nastûriyan

BEŞA SÊYEM

EFSENEYÊN HERÊMA HEKARÎYÊ

3.1. Efsaneya Siyabend û Xeco

Hindî Xecok bû xelka vê Wanê bû, xwîşka heft bira bû, dohmama dozdeh pismama bû. Babê net'da Siyabend. Siyabend rabû Xeco revand bir ser êxista Çîyayê Sîpanê. Wextê'j Çîyayê Sîpanê ser êxistî gotê Xecê çokê xwe deyne da ez çokê xwe li ser çokê te deynim, belkî mirada dilê me'l vêrê hasil bibîtin. Li wêrê Xecokê çawa çokê xwe deyna Siyabend serê xwe deyna ser çokê Xeco. Berê xwe'detê bireke kerêt kûvî'j wê ve hatin. Serê payîzê bû gûnêle bû kelekî mezin bizin'j hemyan standin Xeco berê xwe dayê got p'xwedê Siyabend jî ez ho'j birayên min û ji pismamê min standim, ez îname vêrê li wêrê Xeco hindek rohndik ji çavê wê hatin, Siyabend yî't xew bû rohndik ji çavê wê verest p'rûyê Siyabend ve hate xwarê. Siyabend'j xewa şîrîn hîşyar bû gotê: Xeco te xêrê tû't girî, hekê tu ye pêşemanî qesta mala babê xwe bike. Ewê jî got: ez xwîşka heft bira bûm dotmama dozdeh pismama bûm. Minê mala mêra'l xwe heram kirî piştî Sîyabend. Xeco got min berê xwe da birekê kelokê kûvî'j wê ve hatibû kelokekî mezin kelokek'j hemya standibû. Ew bîr hate bîra min wextê te ez revandim îname vêrê. Siyabend rabû bale tîr kevanên xwe kirin kefte dû kelêt kûvî. Vêrê ne vêrê ne tîrek avêt berda heywanê kûvî birîndar kir. Ço da ser jê ket, ewî şaxekit l'ûrê wî da rakir p' xwe avêt binê zinarî da. Vêca wextê't latê da avaetî ser takekî benokê sekinî, wextê li ser takê benokê sekinî Xecok hindî ma ma Siyabend nehat rabû kire hawar: hay Siyabend tu kanêyî ez te qet nabînim. Welhasil navbeynekê t'çîte hindav wê latê berê xwe't detê Siyabend'p wî takê benokê ve sekinî, gotê Xecê here werîsê heft gundan bîne, kezî û biskên xwe ser ve girê de ka ca çi çare nîne tu min hilkêşî. Xeco rabû ço werîsê heft gundan înan kezî û biskê xwe ser ve girê dan lê belê negihîştê. Piştî hingê Siyabend got: Xecê xwezî min zanîba ka piştî mirna min tu dê serê xwe deyne ser balîfa kê. Ewê jî lê vegerand gotê Siyabendo ez xwîşka heft biran bûm dohmama dozdeh pismama bûm, minê mala'l mêra'l xwe heram kirî piştî Siyabend welhasilî

ev bende gotnê. Siyabend jî gotê here qesta mala babê xwe'p ke, Xeco jî rabû xwe'l dû da avêt xwe xwe li singê wî da ço'p binî keftin got her du yên'l wêrê bûne cotekî spîndaran.

3.2. Efsaneya Gira Marî

Bataneka(çîya) li miqabilî me dar û ber li wêrê nîne, bes çar pênc tiraş li serê wê milêt rêz in. Rexê wê yê berêve t'benê gira marî ji dûr ve wextê mirov berê xwet detê mirov t'bêjê wêhe mar e. t'kene qes e t'bêjin zamanê berê, ew bêriyêt çobûne bêrê ew mar dît got ji tîrsa hima yê bûne tiraş ew mar jî yê bûye ber. Ew mar vê gavê xirek e. Wextê mirov ji dûr ji gundî berê xwe p'detê, mirovit bêt mar e. Cihê wî marî sad metra dirêj e, hima biçîm biçîmê wî ye ji kuryê heta serî û xwe kiriye zirzaq.

3.3. Efsaneya Şêx Smayîl

Şêx Smayîl yê li Çelê/Biyadirê. Li wê rê alem t'çîte ser tirba wî ya li Bîyadirê. Bîyadir ya li bin Çelê da. Alem t'çîte ser tirba wî bi xwe daxwaza jêt ken wextê jinkekê xwedê eyalî nedetê. Lê belê bawerîyeke wan ya we ya hey ku bi xwe t'çin sê çar berkan deynine serêk hekê wan berkan xwe girt mirada dilê wan hasilit bît. Piştî hingê xwedê eyalît detê. Hetta li gundê me jî ew insanêt çoyne wêrê vê gavê neh deh mirovan navê Şêx Smayîl yên deynane ser eyalêt xwe. Yên t'çine ser tirba wî bo eyalît t'çin lê ya min guh lê bûy kurit bin. Hetta t'kene qes e falekî got: Ez ê rabim çime ser Tirba Şêx Smayîl hetta emrê wî qederekê borî jî bû, pîr bibû, got, ço wêrê gote Şêx Smayîl bo min dua bike ku min du kur hebin ez ê du berana demete. T'bêjin sala paştirê wî wextî xwedê du kur danê. Ew her du kurêt wî heta fahma bûn, du beranên xwe jî xudan kirin, qelew kirin û got: Bi xwedê ev her du berane bo Şêx Smayîl gelek in. Rabûn got hima em ê êkî tinê ben beran geleyêt zexim bûyîn. Emrê xwedê got ji çîyayî berek li kurekî wî keft û kurekî falayî kuşt.

Mijar	Efsane (1, 2, 3)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Gundê Aşûtê/Çelê 23.04.2023, 02.12.2023

Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kir	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Selman Edîş
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Gundê Aşûtê, No:214, Çelê
Tehsîla wî/wê	Tehsîla wî tune ye.
Navnîşana Malê	
Navnîşana Kar	Tune ye.
Meil û Telefon	Mail nîne/05333372966
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	Suna-1357@hotmail.com 05442033038

3.4. Efsaneya Şêx Hecî Elî

Gundê me berê mirovekî'p navê Şêx Hecî Elî hebû. Nihe jî tirba wî li gûndê (Derava Seyîdan) me ye. Ew kesên ji nû dahweta xwe kirî, ewên bêeyal û yê miraza dilê wan cih nehatî çine ser tirba vî şêxî û dia t'ken û heyamek ser ve't çît û't bêjin wallah me eyal bûn an jî miraza me hasil bû.

3.5. Efsaneya Şêx Behedîn

Şêx Behedîn berê mirna xwe jî şêxekî cimrî bû, niha jî tirba wî li Dereva Seyîdan e û rex û riyêd wê't girtîne, kesên t'çine ser tirba wî dia't ken newêrîn berekî jî'l ser tirba wî bînîn t'bêjin marên wî şêxî hene wextê me tişte'j ser tirba wî rakir ew marên xwe't rêvitket û ew marên wî rathêline mirovî. Rojekê jinkekê'l ser tirba wî hindek pancar kiribû û wî şêxî jî marên xwe berdabûnê heta cihekî dût dût çobûn.

Mijar	Efsane (4, 5)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Wan 18 .12.2023
Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Zübeyde YALÇIN
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Derava Seyîdan, Colermêgê
Tehsîla wî/wê	Lîsans
Navnîşana Malê	Nexwest parve bike
Navnîşana Kar	Tune ye.
Meil û Telefon	05469624287
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	suna-1357@hotmail.com 05442033038

3.6. Efsaneya Bizina Berze/Wenda

Gava bizina mirov berze bû mirov dê bêjîte melayî, mela ayetekê t'xwînit, heta ayata xwe t'xwînit devê kêra xwe vekirî t'hêlît, gava ayeta xwe xwand devê kêra xwe t'girît û hêdî naveket da ku gurg bizina berze nexwet, gava bizin dît jî hêdî devê kerê xwe vetket.(devê gurgî jî vetbît).

3.7. Efsaneya Xeyribûna Heyvê

Gava heyv xeyrît bîtin, mirov li sêhla û teneka p'det û salaweta bîne, heyv xeyribûna xwe t'berdet.

Mijar	Efsane(6, 7)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Gundê Elemûnê/Qilaban 29.04.2023
Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin
Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Gulê ÖLMEZ
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Aroş/Qileban
Tehsîla wî/wê	Tehsîla wê tune ye.
Navnîşana Malê	Gundê Elemûnê/Qilaban/Şirnex
Navnîşana Kar	Tune ye.
Meil û Telefon	Mail nîne/nîne
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	suna-1357@hotmail.com 05442033038

3.8. Efsaneya Pîra Mirovxwer

Dibêjin berê pîra mirovxwer hebû û mirov't xwarin. Rojekê kiçkekê heft bira hebûn. Birayê't wê her ro t'çone nêçîrê. Xwîşka wa jî ye'l mal bû, haziriya birayê't xwe t'kir. Birayê't wê jî her ro xwîşka xwe tembîhit kir û t'gotê: Kako, gava te mal malî libeke hinarê tu dê bibînî, wê liba hinarê bavê ber kitkê, hekê kitik dê mîste'p agirê teve. Rojekê hindî gazî kire kitkê kitka wê nehat, rabû ew liba hinarê avête devê xwe. Piştî hingê berê xwe dayê kitkê ya'p mîstîye'p agirê kiçkê ve. Piştî hingê rabû, berê xwe dayê dûkeleka't erdekî hiltbît, agir nîne, birayê't wê mane bêşîv. Got hima rabû delingê't xwe hildan û çö. Got'l wê dûkelê çö û çö û çö. T'paşla wê da gilolkeke armişî(hevrişîm) hebû got şohlek't kir û got wê jî hizra keftna wê nekir. Çö wêre got menceleka'l ser kuçkî bû, kiçkeka'l ber menceleka bû gotê eve çî ye? Got: Aha eve hemî sere't mirovan e. Da me pîra mirovxwer e, got eve tu'j kî ve hatî

da min dê te jî xwet û zû agirê xwe'p be û here go rabû kiçkê agirê xwe îna go gilolka wê'l paşlê keft. Got piştî hingê pîra mirovxwer derkeft got: Şildim bildim bêhna mirovê biyanîya tê. Go kiça wê gotê: Tu ye dînî, mirovê biyanî'j kî ve hatîye.. got her we go û her we got. Got dûmahîyê pîra mirovxwer ho berê xwe dayê ew armîşê'j paşla kiçkê keftî dît. Hindî ew gilolka armîşî ye mezin bû heta malê kiçkê dirêj bûbû pîra mirovxwer jî ew armiş hilkir hita mala kiçkê. Hat ber derî gazî kire kiçkê gotê: Ka derî'l min veke. Ewê jî gotê ez derî'l te navekem, pîrê gote kiçkê an heft bira kuştokê an til mêjmêjokê. Kiçkê jî gotê ha tîla min'p mêje. Got tîla wê mêht û mêht ser nişîf çö ve. Got he ro we'l kiçkêl kir. Got rojekê birayê wê gotê: te ku ye tu ho zer bûy. Kiçkê got hal û hewalê min û pîreke mirovxwer eve ye. Got birayê wê gotê. tilê xwe'p ke't nav hevîrî da, tenûrê jî xweş ke û sercilekî jî deyne ser. Bêjê ha rûne ser vî sercîlî. Got ewê jî eynî we kir, xeberê birayê xwe kir. Tenûra xwe xweş kir û wextê wê jî't zanî ka dê kengî êt. Got tilên xwe t'kirne nav hevîrî da û pîrê hat. Kiçkê gotê ka rûne ser vî sercîlî heta ez hevîrê xwe't kem. Got pîramirovxwer kun û kun çot nav tanûrê da û bû xwelî. Got kiçik rabû xwelya xwe rada û bir da'p rêjît. Xwelya kiçkê hêje germ bû. ji ber wê jî hinde xwelî'j tilîsê wê rijt. Got wextê kiçik vejerîya malê t'şûna wê xwelya rijtî kulind û silkê't çêbûyn. Û got kiçkê got p'xwedê ez ê va silk û kulinda bem malê bo birayê wê'p keme şîv. Got êvarê birayê wê hatin ew silk û kulundên kelandî dane ber, got çawa ew şîv xwar hemî bûne berx. Got tinê birayekî wê yê biçûk nivî bû berx nivî mirov ma. Got he ro ew kiçik't çö ber wa berxa rojekê zalamek hat gote wê kiçkê eve çî berx in tu hero'l berî. Kiçkê gotê hal û hewalê min eve ne. Ev berx birayê min in. Got wî zalamî gotê heke tu'p şû min'p key ez ê birayê te sax kem. Got kiçkê gotê erê tu çêke ez ê şû'p te kem. Got ew zalam rabû bi şifanekî deyna wa berxan û hemî çêbûn bûn mirov ve. Tinê yê niv berx û niv mirov ma we.

3.9. Efsaneya Tokê

Tokê sê kiçik bûn, jinbaba wan ew hinartibûne ber kahrka. Êvarê hatin û gotin wallah kahrkên me yên berze bûn. Jinbaba wan got hûn ji kî ve bînin min kahrkên xwe ji hewet vên. Rabûn çon piştî hingê lê gerîyan. êkê got hepo, êkê got pepo êkê got gîdîgîdî gidîgîdî. Hindî lê gerîyan, hindî lê gerîyan, hindî lê gerîyan nedîtin.

Dûmahîka dûmahîk got dua’l xwe kirin û gotine xûdê me’p ke teyr û berde dinyayê. T’bêjin hêj jî ew her sê kiçik’l kahrikên xwe’t gerhin û ew dengê em gelek şevên havînan gûh lê’t bin dengê wan kiçkan e.

3.10. Efsaneya Kûseleyê

Got berê kûsele mirov bû û li ber aşî bû, aşevan bû. Got xûdahna dexlî gote wî mirovî te dexlê min hemî yê rakirî, be ka dexlê min? Aşevanî jî gote xûdahne aşî aha min’p vî rakir aha’p vî kodê’d destê min da. Paşî xûdahna dexlî got îşallah xûdê wî’p bêxîde ser namilê te. Hima got welê hat û ew aşevan bû kûsele û ew kod ma’p piştê ve.

3.11. Efsaneya Werîs û Dastê

Ew jinkê xûdê’j nû eyalid danê, me werîsekit l’dor cihê wê t’aland da ecine xwe nêzikî wê jinkê neken û dastek jî deyna bin serê wê, wê dastê jî ecine’j jînikê dûr’t êxist hita çilkê wê jinkê xilas t’bûn ew werîs l’dor cihê wê bû.

3.12. Efsaneya Ecina

T’bêjin ecina berê gelek xelk aşiqî xwe’t kirin. Yên aşiqî wan jî’t bûn tepit hatê hereketên gelek tarêfi’t kirin. Rojekê ecinekê zalamekî’p navê Evdilla aşiqî xwe kiribî, wî zalamî jî’j tîrsa wê ecinnê’l nik jina xwe jî nennivist û t’bêjin wê ecinê nethêla Evdilla eyal jî bibin gava jina Evdilla’p hali’t keft eyalê wê t’zîkê wê da’t kuştin. Dîsa Evdilayî’p xwe got rojekê’l çîyayî gurgan ew ecine xwar û ji wê rojê wê ve bela wê ya’j min vebûy.

Mijar	Efsane (8, 9, 10, 11, 12)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Colemêrg 18.07.2023
Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Qudret EDÎŞ
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Aroş/Qileban/Şirnex

Tehsîla wê/wî	Tune ye.
Navnîşana Malê	Gundê Aşûtê, No:214, Çelê
Navnîşana Kar	Tune ye.
Meil û Telefon	05336551958
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	sun-1357@hotmail.com/05442033038

3.13. Efsaneyên li ser Zarokên Biçûk

Ew eyalêt j' nû xûdêt dan meqesek kire'd lahnka wa da û tirarekî avê deyna bin lahnka wa da yê'j me çêtiran(cin) jê dûr bikevin heta çilkên wî eyalî xilas't bûn ew meqes û ew av't bin lahnkê't man.

T'bêjin binê pê eyalêt biçûk maç neken. Wextê mezin bûn rêve naçin.

T'bêjin eyala'p gore ve nenivînin çavêt wan kore't bin.

3.14. Efsaneya Mohrka Şîrî

Hecîyên t'çone hecê l'gel xwe mohrkeke spî t'îna. Gotne wê mohrkê, mohrka şîrî. Ew jinkêt şîrê wa nebît an jî kêmbît ew mohrka şîrî't kire stûyê xwe. Piştî demekê şîrê wa zêde't bû.

Mijar	Efsane (13, 14)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Wan 17.07.2023
Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Sarya BERK
Cih û Dema ji Dayikbûnê	
Tehsîla wî/wê	Dibistana Seretayî
Navnîşana Malê	Altintepe mah. 835. sk no:12 kat:2 Tuşba/Van

Navnîşana Kar	Tune ye.
Meil û Telefon	05538803892
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	sun-1357@hotmail.com/05442033038

3.15. Efsaneya Dara Şehîd di bin de

Li gundê me(dêrê) l'ber derê mala me dareka hey. Gelek mirovêt gundê me û yê't derdora gundê me têne ser vê darê dua t'ken, miraza dilê xwe't bên û patekekî vê darê ve't ken. Yê têne ser't bêjin li bin vê darê şehîdêt heyn. Ji ber hindê jî diayên me dê qebûl bîn.

Mijar	Efsane (15)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Wan/19 .12.2023
Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zaningeha Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Siyabend KAÇAR
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Dêrê
Tehsîla wî/wê	Lîsans
Navnîşana Malê	Nexwest parve bike
Navnîşana Kar	112 Wan
Meil û Telefon	05443722162
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste

Meil û Telefon	suna-1357@hotmail.com 05442033038
----------------	---

3.16. Efsaneya Berê Sûmtî

Berê hinde berê sûtî yêt kun hebûn. Ew biçûkê xendekokit (boğmaca) hatê, da bene ber wî berê sûtî. Wextê ew biçûkê xendekok'î lê, t'bin wî berê sûtî da t'bire rexê dî û t'îna. Piştî hingê ew xendekok hima jê't ço.

Mijar	Efsane (16)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Wan 18.07.2023
Navê Saziya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Şewket BERK
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Aroş
Tehsîla wî/wê	Xwendîngeha navîn
Navnîşana Malê	Altintepe mah. 835. sk no:12 kat:3 Tuşba/Van
Navnîşana Kar	Tune ye
Meil û Telefon	05321684292
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	suna-1357@hotmail.com 05442033038

3.17. Efsaneyaya Karvanan

Gava karvanê aşî zimhêr bin ji aşî't hatin bo zivistanê debara zivistanê ku hita biharê't çone aşî gotê zimhêr. Gava îna t'dana derê xanî got zû asinekî danîne ser da kê m neket da ecin nebin.

Gava karvani't hat bezîne xwe t'avête kuçkî. Got da çavê hesûda'p peqin.

3.18. Efsaneyaya li ser Çavên Diêşin

Ew kesên çavêt wan t'êşan, wexta berfa spî çavê wan t'êşand, libeka mêtîjê û berkekî sîrê û libeka mohrka şîn eve pêve t'kirin, rasta çavêt xwe ve t'kirin û gotin eve mohrka matê ye dê çavê wî çêbît.

3.19. Efsaneyaya li ser Bîtîka Çavan

Wexta bîtîki'l qeytana çavê mirova t'hatin, t'gotin vêca çavê bîtîk lê têt ne, çavê dî, kilê dohtmama p'kenê da kerbê yê dî vebin da zû'b peqît.

3.20. Efsaneyaya Tanyê

Çi bûçikê taze(xweşik) bît gava êkî bîyanî t'ço malê, xudahnê malê da bazden çin hinde tanyê'p lama wî ve raden da nazar jê negirît.

3.21. Efsaneyaya Jina Ducan û Marê Kûştî

Wextê jinkek ye'p hamîle ba, mar kuştiba mari't hilavêt. Got heke p'kefte ser piştê û binzîkê wî spî derkevît kiç e, heke durist'p kefte erdê û piştta wî'j ma'p hewa ve got kur e.

Mijar	Efsane (17, 18, 19, 20, 21)
Cihê pêkanîna berhevkarîyê/dîrok	Bêşebab 18.12.2023
Navê Sazîya ku Berhevkarî li Ser Navê Wê Dihê Kirin	Zanîngeha Mardin Artukluyê Beşa Çand û Zimanê Kurdî
Amûra Berhevkarîyê	Bi telefonê, deng hatiye qeydkirin

Ji Bo Kesên Çavkanî	
Nav û Paşnav	Muhammed YİĞİT
Cih û Dema ji Dayikbûnê	Bêşebab

Tehsîla wî/wê	
Navnîşana Malê	Nexwest parve bike
Navnîşana Kar	Tune ye
Meil û Telefon	Nexwest parve bike
Agahîyên di Derbarê Berhevkar de	
Nav û Paşnav/Temen/Tehsîl	Suna Gökalp/30/Lîsansa bêtez
Navnîşan /Kar	Mamoste
Meil û Telefon	suna-1357@hotmail.com 05442033038

ENCAM

Me di vê xebatê de efsaneyên herêma Hekarîyê ku mijarên wan curbicur in, berhev kirin. Efsaneyên me berhev kirin li ser tirban, ecinan, keviran, nezera çavan, heyînên derasayî, ajelan, nexweşîyan û hwd. de ne.

Piranîya efsaneyên ku hatine berhevkirin hêrêmî ne. Lê Tokê, Pîra Mirovxwer û Siyabend û Xeco efsaneyên gerok in.

Piranîya efsaneyên ku me berhev kirin kin in, lê yên dirêj jî hene.

Di hin efsaneyên ku me berhevkirî de bawerîya dînî ya wê civakê, di hindekan de jî rabûn û rûniştina wê civaka ku jê derketîye, derdikeve pêş.

Hat dîtî ku gelemperîya efsaneyan ji aliyê kesên temendirêj ve hatine gotin. Ev jî ji ber qelsbûna çanda devkî ye.

Hat dîtî ku mijarên hin vegêranên din dikare bibe mijara efsaneyan jî.

Di gelek çîrok, destan mît û efsaneyan de jimarên sisê û heftê derdikevin pêş. Di nav efsaneyên ku me berhev kirin de jî em rastî van jimaran hatin (di Tokê, Pîra Mirovxwer, Şêx Smaîl û Siyabend û Xeco de).

Wexta heman efsane ji aliyê vegêrên cuda ve tên guhdarkirin, guhertinên biçûk tên dîtî.

ÇAVKANÎ

Çavkanîyên Nivîskî

Sakaoğlu, S. (1980). *Anadolu-Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu*. Ankara: Ankara Üniversitesi Basımevi.

Buch, W. (2003) “Masal ve Efsan Üzerine”, (Çev.) Ali Osman Öztürk. (Yayına Hazırlayanlar) Eker, G.Ö., Ekinci, M., Oğuz, M.Ö., Özdemir, N. *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*. Ankara: Milli Folklor Yayınları, 304-313.

Luthi, M. (2003). “Masalın Efsane, Menkabe, Mit, Fabl ve Fıkra Gibi Türlerden Farkı”, (Çev.) Sönmez, S. (Yayına Hazırlayanlar) Eker, G.Ö., Ekici, M.Ö., Özdemir, N. *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*. Ankara: Milli Folklor Yayınları, 314-319.

Petikainen, J. (2003). “Efsanenin Yapısı ve Fonksiyonu”, (Çev.) İsmail Görkem, (Yayına Hazırlayanlar) Eker, G.Ö., Ekici, M.Ö., Özdemir, N. *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*. Ankara: Milli Folklor Yayınları, 223-240.

Nişanyan, S. (2021). *Nişanyan Sözlük*. İstanbul: Liberus Yayınları.

Çavkanîyên Malperên İnternetê

T.C Hakkari Valiliği. www.hakkari.gov.tr. (14.11.2023)

<https://ku.wikipedia.org/wiki/Colem%C3%AAArg> (14.11.2023)

<https://www.bernamegeh.org/diroka-bajare-hekari-colemerg/> (10.11.2023)

Çavkanîyên Devkî

1.

Nav Paşnav: Selman EDÎŞ

Temen:70

Navnîşan: Gundê Aşûtê, No:214, Çelê, Colemêrgê

Perwerde: Nexwendî

Dîroka Hevpeyvînê: 23.04.2023, 02.12.2023

2.

Nav Paşnav: Qudret EDÎŞ

Temen:68

Navnîşan: Gundê Aşûtê, No:214, Çelê, Colemêrgê

Perwerde: Nexwendî

Dîroka Hevpeyvînê: 18.07.2023

3.

Nav Paşnav: Sarya BERK

Temen:39

Navnîşan: Altintepe mah. 835. sk no:12 kat:2 Tuşba/Van

Perwerde: Dibistana Seretayî

Dîroka Hevpeyvînê:17.07.2023

4.

Nav Paşnav: Şewket BERK

Temen:45

Navnîşan: Altintepe mah. 835. sk no:12 kat:2 Tuşba/Van

Perwerde: Dibistana Seretayî

Dîroka Hevpeyvînê:18.07.2023

5.

Nav Paşnav: Gulê ÖLMEZ

Temen:64

Navnîşan: Gundê Elemûnê, Qilêban, Şirnex

Perwerde: Nexwendî

Dîroka Hevpeyvînê:29.04.2023

6.

Nav Paşnav: Siyabend Kaçar

Temen:64

Navnîşan: Gundê Elemûnê, Qilêban, Şirnex

Perwerde: Lîsans

Dîroka Hevpeyvînê:19.12.2023

7.

Nav Paşnav: Zübeyda YALÇIN

Temen:34

Navnîşan: Nexwest parve bike

Perwerde: Lîsans

Dîroka Hevpeyvînê:18.12.2023

8.

Nav Paşnav: Muhamed YİĞİT

Temen:56

Navnîşan: Nexwest parve bike

Perwerde: Nexwendî

Dîroka Hevpeyvînê:18.12.2023